

# International Theatre Institute ITI

## World Organization for the Performing Arts



World Theatre Day 2024 – 27 March

**Biography of Jon FOSSE, Norway**  
Norwegian writer, playwright

Kurdish – Kurmancî

---

Jiyanameya Jon Fosse. Nerwêc

Roman nivîs û Şanonivîs ê Nerwêcî

Wergerandin: Salar Mihemed

Jon Fosse nivîskarekî Nerwêcî navdare ku di sala 1959 de ji dayik buye. Ew bi berhemên xwe yê berfireh tê naskirin, ku tê de şano, roman, berhevokên helbestan, gotar, pirtûkên zarokan û werger hene. Şêweya nivîsandina Fosse wek mînimîlîzm (nermahî) û kêrhiya hestiyarî ve tê taybetmend kirin, ku wî dike yek ji şanogerên herî zêde ku jêre hatiye pêşkêşkirin. Di sala 2023-an de, ji ber lîstik û proza xwe yê nûjen ên ku deng dide tiştên ku .nayên gotin, Xelata Nobelê ya Wêjeyê wergirt

Berhemên Fosse ji bo zêdetirî pênçî zimanan hatine wergerandin, ku li seranserê cîhanê li ser hezar sehneyan hatine pêşkêş kirin. Lîstikên wî yê mînimîlîst û hundurîn, ku pir caran bi proza lîrîk û helbestê re sînordar in, kevneşopiya dramatîk a ku di sedsala 19-an de ji hêla Henrik Ibsen ve hatî damezrandin, berdeham dike. Karê Fosse bi şanoya post-dramatîk hatiye girêdan , û romanên wî yê berbiçav tîr ravekirin wek post-modernîst û pêşengî ji .ber kêmalîzm, lîrîzîzm û karanîna hevoksaziyê ya neasayî

Fosse bi lîstika xwe ya bi navê "Nokon kjem til å komme" (1996; "Kesek Dê Bê", 2002), navdariya xwe wekî dramatîstek navnetewî wergirt. Ew roman bi kêmkirina tund ya ziman û vegotina hêzdar a hestên mirovan tê nasîn. Fosse ji hunermendên wekî Samuel Beckett û Thomas Bernhard îlhama xwe digire, ku çawa tîkiliyên herêmî bi teknîkên modernîst pev girêdide. Berhemên wî nediyarbûn û qelsiyên serpêhatiyên mirovî bêyî heqareta nihîlîstî .nîşan didin

Di lîstikên xwe de, Fosse gelek caran gotin an dîmenan nîvco dihêle, hestek tengezariyek bêçareser diafirîne. Mijarên nezelaliyê û xemgîniyê di lîstikên mîna "Natta syng sine songar" (1998; "Stranên bi Şev", 2002) û "Dødsvariasjonar" (2002; "Guherînên Mirinê", 2004) de tîne lêkolîn kirin. Wêrekiya Fosse ya ku di nav fikarên jiyana rojane de kêr diçe, û derbasî .naskirina wî ya berfireh bûye

Romanên Fosse, wek "Morgon og kveld" (2000; "Sibeh û Êvar", 2015) û "Det er Ales" (2004; "Aliss di Agir de", 2010), zimanê wî yê yekta destnîşan dikin ku bi rawestan, navberan, înkarkirin, û lêpîrsînên kûr ve tê naskirin. Trîlojî "Trilogien" (2016) û septolojî "Det andre namnet" (2019; "Navê Din", 2020) bêtir lêgerîna Fosse ya evîn, dijwarî, mirin û lihevhatinê .nîşan dide

Bikaranîna wêne û sembolîzmê ya Fosse di berhemên wî yê helbestî de diyar e, di nav de "Sterk vind" (2021) û berhevoka wî ya helbestan "Dikt i Samling" (2021). Her wiha .berhemên Georg Trakl û Rainer Maria Rilke wergerandiye Nynorskî

Bi giştî, karên Jon Fosse cewhera rewşa mirovî vedikolin, mijarên gumaniyê, xemxwariyê, evîn û windabûnê digirin. Bi şêwaza nivîsandina xwe ya yekta û vekolîna kûr a rewşên .rojane, wî di wêje û şanoya hevdem de xwe wekî kesayetek sereke destnîşan kir

Wergerandin: Salar Mihemed

Koma Şano

Sirya / Qamişlo